Sedat YURTDAŞ

Di ser ewran re

30ê Çileya 2010an li Viyana'yê, li salona "Konserthaus"ê de, hozanê Kurd ê bi nav û deng Şivan Perwer; bi tevlîbûyîna Serokkomarê Avusturya'yê Hans Fishcer, Serokê Herêma Kurdistanê Mesut Barzanî, Hevserokên DTP (Partiya Civaka Demokratik) a ji aliyê Dadgeha Qanûna Bingehîn ve hate girtin, Ahmet Türk, Aysel Tuğluk, Nûnerê AKPê Mîr Mehmet Dengîr Fırat, Serokê HAKPAR'ê Bayram Bozyel, Serokê Enstîtuya Kurd ya Parîsê Kendal Nezan û gelek nûner û mêvanên din ve konserek lidar ket.

Ji temaşevanên bi şans, yek jî ez bûm.

Konsera dîrokî sê saet û nîvan ajot. Hema di despêkê de, bi hêsanî dikarim bibêjim ku, kesên li ser sahneyê bi dewlemendiyeke çavtijîker cih girtibûn, yek bi yek û tev bihev re, herçî ku çû û muzîka xwe jenandin, bi estrûman, bi deng, bi ahenga xwe ya dewlemend ji erdê pêl bi pêl bilind bûn, bilind bûn û gihîştîn ewran; wan di ser ewran re, hûnerên xwe raxistin ber çavan, xwe gihandin guh û dilên

gûhadarvanan/temaşevanan. Bêşik, dê ew ê her, ji ber xweşikî û pêşevaniya xwe ya ast bilid, xwe her û her bigihînin mûzikhezan.

Wan pelek nû, di dîroka mûziga Kurdî de, bi nota û bi herfên zêrîn nivîsandin/afirandin. Mûsiga klasîk a Kurdî û Klasîk mûzîga Rojavayê bi hevre geş bû.

Dema konserê, bi seranserî demek efsûnî bû. Salon, hîn bi nota yên destpêkê re, di bin bandorek tenikî xweş de ma. Bandora armoniya notayan, gav bi gav hêza xwe qewîntir kir. Caran caran hêza sewta mûzîgê welê qewîn bû, ku meriv, bivênevê ji cih û wexta ku lê dijîya diqetiya. Ji keliya lê, rizgar dibû. Diçû deverên din, deverên ku berê tu di xewnên şevan de jî nehatibû dîtin. Diçû demên din, demên ku qet lê nehatibû jiyîn û dê tu carî jî nehata jiyîn.

Li saheneyê, ji bîst milletan mûzîkjen hebûn. Li ber her yekî notayên estrûmanên wan, an gotinên helbestan hebûn. Her yek di kêliya dema xwe de tevlê kilamê dibû. Dengê xwe, rengê xwe û ji rûhê xwe notayan belav dikir û xwe bera nava ar û pilotiya kilaman dida.

Li sahneyê bi dehan estrûmanên mûzîgê hebûn. Saz a ku di despêka hûnermendiya Şivan de, heya îro pê re li dehan welat û li sedan bajar û bajarokan bi hevre bibûn mêvan, û mîna wî bi dehan salan li sirgûniyê dijiya. Bilûr a ku di her nefesê de, dilê meriv di cihê herî nazik de digûvişîya. Def a dem û dewranan; a ku bibû dengê îlana şer û gaziya hewaran. Û hemû cûreyên bikevanan, hemû kemanan. Keman a ku di navîna amûrên mûzîgê de herî nezîkê dengê însên tê qebûl kirin û hem bi serê xwe tenê û bi hemû amûran jî dikare bi awayekî lihev bê û dengê xwe biniqûtîne nava dilê mirovan. Arp a ku mîna amûrê mûzîga xwedawendan tê hesibîn… û qanûn û erbane …

Sahneya ku bi van amûrên mûzîgê û mûzîkjenan ve têr û tijî, meriv ji xwe dibir.

Çi nebe ew konser li welatê Amedeus Mozart, Joseph Haydn û xendakarên wan Ludwig van Beethoven -her çiqas li Bonnê hatibe dinyayê jî li Viyana yê bi maneya navê xwe bûye mûzikjen û helbestvan- û bajarên gelekên din lidar diket.

Mozart ê ku di navbera 35 sal emrê xwe de, 626 berhem; Joseph Haydn ê ku 800 berhem**;** Ludwig van Beethoven ê di gelek cûreyan de gelek helbestên nemir afirandiye, li wî bajarî konser lidar ket.

Di konserê de tevlî surprîzeka berhemek Willi Resetarits ve nozdeh berhem hatin bideng kirin. Dudoyên ewûlî yên Ludwîng van Beethoven, du soloyên Dilşad Said û tevlê kemana Dilşad Said ve yekê Saint Seans û donzdeh kilamen Şivan Perwer.

Hêviya Te, Ya star, Bila bê, Dergevanê Derya Evînê, Hozan, Dayîk, Cana Min, Dihok, Delalê, Çavreş, Derweşê Evdî û Lo Mamo.

Şivan Perwer careke din, şopek veda. Şiverêyek çêkir. Astek nîşan da. Asoyek ava kir. Di vî karê pîroz de ne li ser sahneyê û ne jî li pişt sahneyê ne bi tenê bû.

Li ser sahneyê, mûzîkjenê Kurd ya bi nav û deng, vîrtûozê kemanê Dilşad Said ê ku bi mehan notayên her estrûman û mûzîkwan

rizik bi rêzik di stûrbûna pirtûkeka pîroz de, nivîsand û bi xweşikî lihev anî, lê da, da lêdan, da gotin, hebû.

Li rex wî, Azîz Sadikoviç'ê ku çanda xwe ji Anadolê girtiye û bi her awayê xwe mozaîga çanda erdnîgariya Tirk û Kurd û Ermen û Deryasipî di hundirê xwe de kemilandibû, mîna şefê orkestrayê hest û xwêdana xwe tevlê xabatê kir, hebû.

Û keç û xortên ku bêyî nasnameyên xwe yên mûzîkjenîyê ji hemû nasnameyan azadbibûn, li ser sahneya navneteweyî bûn.

Li pişt sahneyê jî Ali Gedikê ku ev bi dehan salin bêyî dostaniya Şivan Perwer, xwe amadeyî xizmeta mûzîk û çanda Kurdî kiriye û bi xebata xwe jî bi Serokomarê Avusturyayê re biye dost hebû.

Amed Mêrdînê ku di pêy sirgûniya xwe, doktora xwe rawestand û di xizmeta mûziga Kurdî de, şev û rojên xwe boneya ameda kirina broşûra programê û wergera kilaman kiribû hebû.

Serokkomarê Avusturiya Hans Fischer di despêka konserê de:

“Her însan din, ziman rengê çerm çi dibe bila bibe divê azad bijî, û cûda. yetî lê lê neyê kirin. Ji boneya mazûvaniya vê konsera xweşik, li ser navê welatê xwe Avusturyayê pir bi kêf im. Dîtina serokê delal Mesut Barzanî min zêdetir bi kêf kir. Ez wî ji zaroktiya wî ve nas dikim. Çand û hûnerê gelek kes anîn cem hev. 30 salên dawîn min ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd gelek ked da. Ez welateke ku Kurd tê de bi azadî zimanê xwe yê dayîkê biaxifin û çanda xwe bijîn daxwaz dikim“

Bi konsera Viyana yê re, klasik mûzîka Rojavayê û klasîk mûzîga Kurdî, hate ber hev. Lihev piçikî. Bi hevre deng veda.

Ji aliyê din Şivan Perwer, tiştên ku Kurdan bi hemû hêza xwe ve heya îro roj pêknaînîne, wî bi hûnera xwe ve dîplomasiyek payebilin, dîplomasiyek ku Serokkomarê Avusturiya yê û serokê Herêma Kurdistanê û ji partiyên cûda cûda nûnerên Meclîsa Tirkiyê tê dê, bi serkeftî pêk ani.

Dest xweş, deng xweş, sewt xweş, sihat xweş… 27 Reşemî 2010

syurtdas@yahoo.com